Newroz Hejmar (75) Rûpel (6) Êlûn 2007z – 2619k

Gotina
Partiya Yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê

Xwîşk û birayên hêja

Rêz û hurmet ji we hemiyan re, ji vê hazirbûna we ya giranbuha re, ji gundê Maratê re. Bila serê we hemiyan sax be.

Mamoste Edîb Ibrahîm ê ku, di nav hevalên xwe de, bi Edîbê Maratê dihate naskirin, netenê berketiyê Maratê û herêma Kurdaxê bû, lêbelê , berketiyê miletê xwe yê Kurd û welatê xwe Sûriyê bû, merovekî welatparêz, demokrat û mirovhez bû. Ew ji neçarî, ji ber nexweşiya xwe , berê xwe dabû xerîbiyê, lê hiş û dilê wî li cem we bû, bi axa welêt û xelkê xwe re bû. Daxwaz û hêviya wî, ew bû ku, di mezela gundê Maratê de were veşartin.

Rehmetî, hêja kek Edîb, di dilan de, cî girtibû, bi sedan, bi hezaran kes, ji Kurdaxê, Kobaniyê, Cizîrê û li Awropa jê hezdikirin, ji ber ku, rehmetî, hevalekî dilsoz, rastgo û merd bû, bi dilûcan li zimanê dê, dibû xwedî û li dirêjahiya bêtirî 35 salan, di kar û xebatê de, berdewam bû, xemxwarê milet û partiya xwe bû, hergav li dijî keysebazî û serberdayetiyê bû, loma jî, li ba heval û rêxistina xwe mabû ciyê rêzgirtin û hezkirinê.

Ji berî barke û here Almaniya, li gelek gundên Kurdaxê mamostatî kiribû, têra xwe , xwe diwestand û bi herhawî dixwest ku, xwendevan haj xwendina xwe hebin, bixwînin, pêşkevin û wenda nebin. Hêja Edîb Îbrahîm hevalekî cefakêş û nefis biçûk bû, tim û tim, xwe dêndarê miletê xwe didît. Bi dilsozî siyaseta parta xwe diparast, biratiya Kurd û Ereb, parastin û pêşketina Sûriyê, lihevkirina hêzên welatparêz û demokrat, jê re doz û armanc bû, hevalekî têgihaştî û bîrewer bû ,hevalê hevalê xwe bû .

Çûna kek Edîb netenê xisara malbata wî û gundê Maratê bû, lê belê xisara Kurd û Ereban, xisara Sûriyê û tevgera demokrat bû.

* Bila serê xwîşk , bira û mervên Kek Edîb sax bin .
* Dost , heval û hogirên partiya wî û tevgera Kurd xweş bin.
* Herdu kurên rehmetî, Pêşrew , Zardeşt û diya wan xweş bin
* Heval Edîb ji bîr nabe.
* Hûn tev bijîn bona biratiyê, bona Aştî, Azadî û Wekheviyî.

Û sipas ji guhdariya we re .

26-08-2007